

Mişkê Gundî û Mişkê Bajêrî

Çirok: Keleşorê Cihani

Wergeran û Sinarî: Evraz Hisîn



Mişkê Bajêrî digehite gundî û ji layê Mişkê Gundî ve bi germî dihête pêşwazî kirin.

-Tu çewanî heval?

-Wey tu li ser çawan hatî hevalê min ê xweştî!

Nûke tu gelekê birsî dê kerem ke da biçin bixweyn

Erê destşoya we li kirê ye?

Destşo çî ye babo? Eger te bivêt destên xwe bişo ew coka avê ye li wêrî.

Dê kerem bike heval! Eve genime... Eve jî cehe.. Eve hindekkêz û kulliyên ter û tolin! Vêca dilê xwe pê nesoje!

Genim û ceh çî ye? Eve bo didana di xirabin. paşî eve çî kêz u kull ne? Te dilê min reş kir.

Panê eve xweştirîn xwarina mine! Pa tu çî dixwey?

Tû were seredana min û bibîne ka ez çî



Miškê Gundî piştî heyamekê diçite seredana hevalê xwe li bajêrî. Li devê bajêrî digehine êk û diçine ser û stûyên êk..



Wey babo eve çi ye?
Eve çi çiyane? wên
he çi canewerin hosa
bilez bi rê ve diçin?

Miškê Bajêrî: Ew
avahî ne, ne
çiyane! Ewên he ji
turimbêlin, ne



Ka dê were
nûke tu yê birsî
da biçin xwarinê
bideme te!



Erê wella ezê birsime. Her çende min dû
kêz û kuliyekê qelew jî bi rêve yên xwarin.



Miškê Bajêrî
hevalê xwe
dibete di
metbexa malekê
ve û diçine di
kawenterekê da..

Miškê Bajêrê: Dê
bixwe heval! Eve
guwîz, bahîv,
penîr, kêk te çi



Wey! Bi rasti tu yê
di beheştê da! Eve
xwarina te ye lewra
tu bi xwarina min
razî nedibûy!



Ji nişkekêve xwudana malê dergehê kawen-

Xwe xilaske eve kabaniya malê hat.



Ez negehiştim çi bixwem jî. Kabaniya Malê kî ye?

Oooh kabaniya malê em dîtibayn da me bi kêzka kujît. Bes çi nîne dê nûke çit û em dê çine wêrê ve.



Jinik derdikevît.



Mişkê Bajêrî hevalê xwe dibete ser mêzeyekê tijî ser tiştên xweşin wek mewlj û hijîr û qeysî û çiklêt û çerezan.





Hêsta Mişkê Gundî dest bi xwarinê nekîrî pişikê malê gotî miyaw..



Xwe xilaske eve Givir hat.



Ew çi bû heval? Vêca Givir kî ye?

Ooooh Givir canewerekê gelek dirind-eye! Wî em dîtibayn da wê gavê me xwet û av bi ser da nedikir.



Were da biçîne serdavê dê wêrê ya tena bit û dê bi dilê xwe xweyn.



Heval sehkê min çi dît. pirteka penirê xweş.

Ne ne ne! Xwe nêzik nekey! Ew telhe!



Vêca Telh çi ye babo?

Telh li ber me dihêne vedan. Eger nûke tu biçî wî penirî bixwey dê êkser sitüyê te kevîte di ber şîşkeka asinî ra û dê xendeqî!



Ez bo te tiştkekê bêjim heval, bi rastî tiştên xweş li bajêrî hene û ew tişt li gundî nînin. Lê ev tirs û lerza mirov têda hindê nainit.



Bi xatira te ez dê çime gundê xwe. Li wêrê ne kabanî hene ne Givir û Telhe !

